Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1049 | 19-Adar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Bi xaniyên kerpîç rêwîtiya di demê de...

**Amna al-Faqîh a Fîlîstînî ku di mala xwe ya ji kerpîç de bi eşyayên xwe yên antîka di nav demê de rêwîtî dike, şîret li ciwanan jî dike ku xwedî çanda xwe derbikevin.**



Amna al-Feqîh a bi xaniyekî kerpîç ya yek odeyî ku çêkiriye, kevnartiyê tinê heta roja me ya îro, armanc dike çanda Filistînê jî dibe jiyîn.

Amna al-Feqîh di mala kerpîç ya yek odeyî ku wê li kêleka mala malbata xwe çêkiriye, bi demê re rêwîtî dike. Diyar dike ku mala ku bi eşyayên antîka xemilandiyê, ku ji ber ji jiyana bi deng a bajêr xilas bibe û hesreta xwe ya paşerojê derbas bike, çêkiriye. Bexçeyek xweş û bi darên zeytûn û qitroyan ya mala Amna al-Feqîh heye. Eywana ku li baxçe çêkiriye balkêş e. Eywan ji bo kesên werin dîtina malê çêkiribû. Amna al-Feqîh dibêje, "Hemû kes wek muzaxaneyek gestiyarî ji bo dîtina li vir tên" diyar kir ku ji kesên tên pereyan nastîne, xwarin û vexwarin pêşkêş dike û sohbetan dike.

'Divê ciwan xwedî çanda xwe derbikevin'

Amna al-Feqîh a 80 salî ku hesreta xwe ya ji bo rabirdûyê her car tîne ser ziman, diyar dike ku sedema ku malekî kerpîç ava kiriye ew e ku mîmariya Filistînê bîne roja îro. Em bi Amna al-Feqîh re dikevin mala yek odeyî. Di hundurê de em sihûn, halet, simkên sêman, firn, selikên xasir û gelek tiştên din ên kevn ên ku bi awayekî rêk û pêk hatine danîn, dibînin. Amna al-Feqîh, anî ziman ku çîrokek her eşyayê heye û ji bo lambaya gazê ya girt wiha got: "Mînak ev ji zarokatiya min e. Ji ber ku ceyran tunebû me her tim vî ya bikaranî" û da zanîn ku biraziyê wê jî di dîtina tiştên antîka de alîkariya wê dike.

Amna al-Feqîh destnîşan kir ku zû dest bi rojê dike, piştî taştê dixwe tê mala kerpîç paqijiya rojê dike. Amna al-Feqîh şîretan li ciwanan dike ku xwedî mîrata xwe ya çandî derbikevin.

Em bi hesta ku di nav demê de rêwîtî kir ji Amna al-Feqîh dur dikevin.

JİNHA

# Sûlavka dêw a plazmayan

**Dîwarekî ji plazmayên gazê yên nêzî 100 hezar kîlometreyan bînin ber çavên xwe. Zehmet e, ne welê. Lewma mirov bi 40 hezar kîlometreyan li cihê herî fereh ê dinyayê dikare li dora wê bigere. Vê carê mirov çawa dîwarekî du caran lê texeyul bike.**

Dîmenekî nû yê rojê, kêliyeke welê girtiye, ku dîwarekî dêw ê ji plazmayên gazê li ser rojê peyda bûye. Ev dîwar 96 hezar 500 kîlometreyan bilind bûye. Û paşê weke sûlavkekê bi ser rojê de bariyaye.



Ji vê bûyera dîwarê ji plazmayên li rojê re "Beloqiya tacê ya qutbî (PCP)" tê gotin. Ev wêneyê nû 9´ê Adarê hatiye girtin.

Kesê wêne girtî wênegirê stêrkan Eduardo Schaberger Poupeau ye. Ew wêneyên xwe ji bajarê Rafaela yê li Arjantînê digire. Wî got, "Dîwarê plazma qederê 100 hezar kîlometreyan bilind bû ji zemîna rojê. Li ser ekrana kompûtera min weke bi sedan xetên plazmayan xuya dikirin ku weke dîwarekî xwe berdidan jêr."

PCP esas, weke teqînên gazên îyonîzebûyî ne ku bi tesîra enerjiya meydana meqnedûzî weke teqînan didin der. Lê ew nêzîkî qutbên Bakur û Başûr ên meqnedûzî yên rojê diqewimin. Ji ber wê jî gelekî xurt û mezin in. Gava bi ser zemînê rojê de ji nû ve dibarin, weke dîwarekî ji avê xuya dikin. Ji ber wê jî navê "Sûlavkên plazmayan" jî li wan hatiye kirin.

**Y. Ozgur Politika**

# Ciwanên Mexmûrê bi meşaleyan ber bi tekoşîna Newrozê meşiyan

**Navenda Nûçeyan**

**Li Wargeha Penaberan a Mexmûr bi boneya Cejna Newrozê bi pêşengtiya Yekîtiya Xwendevanên Azad (YXA) meşekî meşaleyî ya girseyî hate li darxistin û ciwanan peyam da û got, em ê Newroza 2023'yan bikin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û Kurdistanê.**



Li gor nûçeya rojnameya Rojev, li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî bi boneya Cejna Newrozê, bi pêşengtiya Yekîtiya Xwendevanên Azad (YXA) meşekî meşaleyî hate li darxistin. Xwendevanên wargehê li ber dibistanên xwe kombûn û agir bi meşaleyên xwe xistin û ji dû aliyan ve berê xwe dan Çiyayê Qereçox. Di meşê de bê navber dirûşmeyên 'Newroz li Rêber pîroz be' û 'Bijî Serok Apo' hatin berzkirin. Piştî ku meş gihişt serê gir daxuyaniyek ji aliyê ciwanê bi navê Delîl Kaya ve hate xwendin.

Di despêka daxuyaniyê de Cejna Newrozê li Rêber Apo, li gerîlayên serê çiyan berxwe didin û li gelê çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat hat pîrozkirin û wiha hat doandin:

"Her wiha di kesayeta şehîdên Newrozê yên weke Mazlum Dogan, Zekiye Alkan, Sema Yuce, Bêrîvan û Rehşanan de hemû şehîdên têkoşînê bi rêzdarî bibîrtînin. Bê guman xeta berxwedanê ya Mazlum, Kemal û Zekiyeyan bû ku ev meş ronî kir, em van hevalên ku wate dane Newrozê bi minetdarî bibîrtînin. Di dîroka gelê Kurd de Newroz her tim bûye nîşaneya berxwedan û yekîtiyê li hember zilmê. Kurd îro pêkhateyek wisaye ku dixwazin berxwedanê berdewam bikin û yekîtiya xwişk û biratiya gelan, bi rêya demokrasiyê pêkbînin.

Gelên cûda bi hatina biharê weke cejnan pîroz dikin, lê Newroz ji bo Kurdan wateyek din heye. Newroz ji bo Kurdan ew roja ku gelê Kurd bi pêşengiya Kawayê Hesinkar agirê serhildanê li dijî şahê Aşûriyan Dehaq pêxistî û bi serkeftinê tacîdar kiriye. Lê di roja me ya îro de neviyên Dehaqê zilimkar AKP-MHP bi heman sîstemê zordariyê li ser ciwanên gelê Kurd pêktînin. Çawa rêheval Mazlum û hevalên wî serî li himberî zilmê netewand û bi ruhê xwe yê berxwdaniyê agirê bedena xwe xistî Cejna Newrozê pîroz kir, wê ti carî agirê Kawayê Hesenkar ne vemire û wê bi ruhê berxwedanê dawî li dagirkeriyan bînin.

Wê ev Newroz bibe Newroza yekîtiya netewa gelê Kurd û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo. Gelê Kurd bi felsefeya Rêber Apo xwe bi rêxistin dike û li dora paradîgmaya azadiyê dimeşe. Rêber Apo bi vê paradîgmaya xwe xeta jiyana azad afirand. Em carek din dibêjin eger jiyan hebe, wê li dora vê çarçoveya vê paradîgmayê be. Emê bi felsefeya Rêber Apo jiyana azad û wekhev bi afirînin. Li ser vê bingehê Newroza 2023'yan bikin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û Kurdistanê."

Piştî daxuyaniyê li ber stranên gelêrî govend hat gerandin û dirûşmeyên 'Bê Serok Jiyan Nabe' û 'Newroz li Rêber pîroz be' hatin berzkirin.

Sudoku: Bersiv 58

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 3 | 1 | 9 | 8 | 4 | 6 | 5 | 2 |
| 9 | 5 | 8 | 2 | 1 | 6 | 4 | 7 | 3 |
| 4 | 2 | 6 | 7 | 3 | 5 | 1 | 9 | 8 |
| 3 | 1 | 7 | 4 | 9 | 8 | 2 | 6 | 5 |
| 5 | 8 | 4 | 6 | 2 | 1 | 7 | 3 | 9 |
| 2 | 6 | 9 | 5 | 7 | 3 | 8 | 4 | 1 |
| 8 | 4 | 3 | 1 | 5 | 7 | 9 | 2 | 6 |
| 1 | 7 | 2 | 3 | 6 | 9 | 5 | 8 | 4 |
| 6 | 9 | 5 | 8 | 4 | 2 | 3 | 1 | 7 |

Sudoku:Pirs 59

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 6 | | 1 | |
| 1 | 7 | | | | | | | 2 |
| 4 | 8 | 6 | | | | | | 7 |
| 2 | 1 | 7 | 6 | | 3 | 5 | | |
| | | | | 1 | | | | |
| | | 4 | 5 | | 8 | 1 | 2 | 9 |
| 9 | | | | | | 4 | 8 | 3 |
| 6 | | | | | | | 7 | 1 |
| | 2 | | 1 | | | | | |

## Quncika Têgînan

| Bandor | Te´sîr |
|---|---|
| Gengaz | Mûhtemel |
| Girîng | Mûhim |
| Pankart (Fransî) | Di civîn û xwepêşandanan de, karton yan jî cawê gotinên kurt li gorî armancê li ser hatîn nivîsîn: *Di çalakiyê de parkata "Bimire Dagîrkerî" hat vekirin.* |
| Çalak | Kesê her tim di nava liv û tevgerê de. Jîr, jêhatî, zindî: *Miroveki çalak e* |
| Pêvajo | Ji bo demeke diyar: *Di pêvajoya şerê cîhanê de xela çêbû.* |
| Pêwendî | Têkilî |
| Plan (Fransî) | Ji bo pêkanîna karekî yan berhemekî çêkirina rê û rêbazên wê: Plana xaniyê me hatiye çêkirin. *Ji bo êrişa ser dijberê xwe plan çêkirin.* |
| Proje (Fransî) | Di gelak qadan de planeke zanistî ye ku berê hatiye amadekirin, lêçûna wê hatiye hesabkirin, dem jê re hatiye veqetandin û ji aliye rêveberiyê ve hatiye qebûlkirin: *Projeya ava bajêr dest pê kir.* |
| Protesto (Îtalî) | Dijberiya li hemberî, biryar yan jî kiryarekê: *Kurdan Peymana Lozanê protesto kir.* |

# 'Pirojeya mirovahiyê ya demokratîk dîl girtiye!'

Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku armanca tecrîda giran ya li ser Rêber Apo pûçkirina vîna jin, civakê û gelan e û gotin, Azdiya Rêber Apo pêkanîna pirojeya mirovahiyê ya demokrasiyê ye. R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1049 | 19-Adar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# RÛSYA RÊ VEKIR, TIRKIYÊ DAGIR KIR Û CÎHANÊ JÎ XWE BÊDENG KIR






## 'Wê Efrîn ji destê dijminê nirxên mirovahiyê bê rizgarkirin'

Xwendekarên Zanîngeha Rojava ku ji bajarê Efrînê ne diyar kirin ku dewleta tirk dijminê nirxên mirovaiyê ye û teqez kirin ku wê bi têkoşîn û berexedanê, Efrînê rizgar bikin. Herwiha dan zanîn ku wê sûcên dijmirovî yên dewleta Tirk bê hesab nemînin. R-5

## Dagirkeriyê 'Efrîna Aşîtiyê' veguherand navenda sûcan

### Li aliyekî êrşî û li aliyê din jî dorpêç

Dewleta Tirk a dagirker wekî her car bi tevahiya hêza xwe hyewil da ku têkoşîna gelê Kurd têk bibe û aloziya Sûriyê li gor xwina xwe ya Osmaniya nû, bikar bîne. Ji ber wê, ji destpêka aloziya Sûriyê ve destek da komîn çete yên radîkal yên Islamî û berê wan da Rojavayê Kurdistanê. Çeteyan Cebehet Alnusra û Alqaîde, bi ferman û destekdayîna dewleta Tirk êrîşî herêmên Rojavayê Kurdistanê kir. Li aliyê din jî rêjîma Sûriyê herêm dorpêç kir.

### DAIŞ'ê bi fermana Tirkan êrîş kir

Li hemberî destkeftiyên Rojava, dewleta Tirk a dagirker kêliyekê ranewestiya, vê carê li pêş çavên cîhanê çeteyên DAIŞ'ê ji tevahiya cîhanê kom kir û ew derbasî Sûriyê kirin . Bi belge û tesbîtan, Tirkiyê çekên giran radestî çeteyan kir û di tevahiya aliyan de alîkariya wan kir. Careke din bi fermana dewleta Tirk ,çeteyên DAIŞ'ê ku artêşên wekî Artêşa Iraq û Sûriyê xwe li ber negirt, êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir.

### Tirkiyê xwest tola DAIŞ'ê rake

Ji ber têkçûna çeteyên DAIŞ'ê, dewleta Tirk bi hêrs bû û bi komên çeteyan, di 20'ê Çileya 2018'an de bi hejmareke mezin ji balafirên şer, tang, mûşek û tevaiya çekên giran yên ku ji NATO'yê digre, êrîşê herêma Efrînê kirin. Piştî 58 rojan ji berxwedaniyeke dîrokî ya gel, Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a faşîst û komên çete yên girêdayê wê ve, hat dagirkirin..

### Kiryarên dagirkeriyê bênavber didomin

Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û heta niha, kiryarên dijmirovî yên dewleta dagirker ya Tirkiyê û çeteyên wê ku li ser gelê Efrînê didin meşandin, bênavber dewam dikin. Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê , piştî dagirkirina Efrînê û heta niha, dagirkeriya Tirk û çeteteyên wê zêdetirî 665 welatiyên Efrînê kuştin e, ji wan jî 97 jin in. Herwiha li dijî 71 jinan destdirêjî hatiye kirin û 213 jin di bin tundî û îşkenceyê re derbas bûne û zêdetirî 10 zarokan hatine kuştin...

### Li Efrîn guhertina demografîk bi lez birêve diçe

Li gorî amarên fermî ji ber êrîşên dagikeriya Tirk zêdeyê 300 hezar welatiyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin û li herêma Şehbayê xwe di nava kampan de bi cih kirin. Piştî dagirkirina Efrînê û valakirina wê ji gelê wê yê resen, dagirkeriyê nêzî 400 hezar ji Erebên Xûtaya Şamê, parêzgeha Idlibê û navçeyên cuda ên Sûriyê li Efrînê di mal û milkên Kurdan de bicih kirin û demografiya Efrînê didin guhertin...

### Xweza jî ji sûcên dagirkeriyê bê par nema

Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ne tenê li dijî mirovan kiriyarên bê exlaqî dikin, herwiha li dijî ekolojiyê jî sûcên giran kirin û dikin. Dagirkeriyê ji destpêka dagirkirina Efrînê ve bi hezaran darên zeytun û mêweyan birîne. Herwiha bi 10 hezaran darên din ji bo firotinê hatine qutkirin. Li gorî ku hatiye tesbîtkirin milyonek û 300 hezar darên biber û bêber hatine birîn.

### Dewleta Tirk deverên dîrokî yên Efrinê talan kirin

Li kêleka dizî, kuştin, revandin, guhertina demografîk û xerakirina ekolojiyê jî, qirkirina çandî jî bi awayekî sistamatîk ji aliyê dagirkeriyê ve tê meşandin. Piraniya cihên şûnwarî yên Efrînê ji aliyê destê çeteyên tirkî ve hatîne talankirin û wêrankirin.

### Dagirkerî cihên olî û pîroz dike armanc

Li Efrîn tu tişt ji terora dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê xilas ne bûn, heta ji cihên piroz jî tişt hatin dizîn û rûxandin. Wekî Ziyareta Şêx Elî li gundê Basûfanê ku hate vala kirin û tiştên di hundirê wê hatin xera kirin her wiha bi rûmeta gelê Êzîdî hat lîstin. Ziyareta Şêx gerîb ya li Gundê Sînka li navçeya Şera hate rûxandin. Ziyareta Qere Cirnê yê nêzî navçeya Meydankê hate ruxandin. Ziyareta Melek Edî li Gun Qîbarê hate rûxandin...

## 'Nerwroz ji bo jina Kurd Roja vejînê ye'



Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku Newroz ji bo jinan tê wateya vejînê û gotin, Newroz ji bo gelê Kurd û bi teybet jina Kurd, roja bilindkirina asata têkoşînê ye. Herwiha dan zanîn ku Newroza 2023'an wê bibe Newroza azadiya Rêber Apo. R-2

## YPG: Bi ruhê fermandar Karker em ê Efrînê rizgar bikin

Di salvegera 5`an a şehadeta fermandarê Berxwedana Serdemê Karker Êrîş de, Fermandariya Giştî ya YPG'ê soza bidawîkirina dagirkeriyê li Efrînê nû kir. R-3

## Rewşa kargehên savarê li bakur û rojhilatê Sûriyê

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Kargehên çêkirina savarê, ji bo peydakirina hewcedariya welatiyan tevî rûbirûbûna astengiyan kar dikin. Hevserokê ofîsa pêşesaziyê Hisên Usman jî got, Em bi hemû derfetan hewl didin pêwîstiya herêmê ya bi savarê peyda bikin. R-6

# ’Pirojeya mirovahiyê ya demokratîk dîl girtiye!’

Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku armanca tecrîda giran ya li ser Rêber Apo pûçkirina vîna jin, civakê û gelan e û gotin, Azdiya Rêber Apo pêkanîna pirojeya mirovahiyê ya demokrasiyê ye.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di sala 1999’an de, di encama Komployeke Navneteweyî de ku gelek hêzên navneteweyî tê de cih girtin, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dîl hat girtin. Rêber Apo ji wê demê ve û heta niha li girtîgeha Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ye. dewleta Tirk a faşîst hevdîtina Rêber Apo bi parêzer û malbata wî re qedexe dike. Herwiha Ji beriya 23 mehan ve û heta niha tu agahî ji Rêber Apo nehatin e girtin

Derbarê tecrîda giran ya li ser Rêber Apo Jinên bajarê Qamişlo ji me re axivîn û diyar kirin ku ewê ji bo azadiya Rêber Apo asta têkoşînê bilind bikin. Herwiha dan zanîn ku azadiya Rêber Apo azadiya jin û civakê ye.



### ’Bêdengî tê wateya hevkariyê’

Endama Navenda Lêkolînên Istiratijîk Rozelîn Bekir bêdengiya hêzên navneteweyî ya li hemberî tecirîda giran ya ser Rêber Apo şermezar kir û got: “Bêdengiya hêzên navneteweyî li hemberî tecrîda giran ya ser Rêber Apo, rûyê qirêj yê van hêzan eşkere kir. Herwiha bêdengiya tê watiya erêkirin û hevkariyê. Her kes dizane ku dewleta Tirk bê destekdayîna dewleteyên rojavayî, nikare tu biryarê bistîne, di dîlgiertin û tecrîdkirina Rêber Apo de jî, rola hêzên rojavayî sereke ye.”

Rozelîn da xuyakirin ku projeya Rêber Apo dikeve xizmeta tevahiya mirovahiyê û wiha domand: “Rêber Apo ji bo çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn projeke demokratîk saz kir. Ev proje ji bo tevahiya gelan kilîta azadiyê ye. Lê ji ber ku Projeya Demokratîk ne li gorî berjewendiyên hêzên hegemon bû, Rêber Apo dîl girtin û heta niha di bin tecrîdeke giran de ye. Armanca dewleta Tirk ji tecrîda giran ya ser Rêber Apo têkbirina projeya Newteweya Demokratîk ku li ser bingeha xuşk û biratiya gelan pêş ketiye, Herwiha pêşgirtina li rêxistinbûîna gelên herêmê.”

### Fikrê Rêber Apo li Kurdistan heye Efrîkayê..

Endama Navenda Lîkolînên Istiratijîk Rozelîn bekir bang li rêxistinên hiquqî kir ku bi erkê xwe yê exlaqî rabin û axaftina xwe wiha qedand: “Her ciqas bixwazin bi tecrîdê fikrên Rêber Apo sînordar bikin wê nikaribin, berovajî wê fikrê Rêber Apo ne tenê li Kurdistanê belav bûye, li tevahiya cîhanê belav bûye, mînaka wê jî, beriya mehekê Konferanasa Azadiya Ocalan li Efrîkaya Başûr hat lidarxistin û gelek kesayetên hiquqî yên li ser asta cîhanê tê de hazir bûn. Em bang li rêxistinên hiquqî û yên mafê mirovan dikin ku bi erkê xwe rabin û li hemberî tecrîdê bêdeng nemînin.”

### ’Ji bo azadiya Rêber Apo çalakiyan xurtir bikin’

Dayika bi navê Roza Çolê ku dayika şehîdekê ye jî, tecrîda giran ya ser Rêber Apo şermezar kir û wiha got: “Rêber Abdullah Ocalan bi felsefeya xwe tevahiya mirovahî ronî kir. Heta ku Rêber Ocalan fîzîkî azad nebe, em nikarin behsa azadiyê bikin. Em wekî jin û malbatên şehîdan heta ku azadiya fîzîkî ya Rêbertî misoger nebe, em qet naskinin, herwiha em ê asta berxwedanê bilind bikin.”

Roza Çolê di dawiya axaftina xwe de bang li gelê Kurd û gelên azadîxwaz kir ku ji bo azadiya Rêber Apo çalakiyên xwe dewam



bikin .

### ’Tu hêz nikarin jinan ji felsefeya Rêber Apo qut bikin’

Endamê Meclisa Malbatên Xêriya Xelef jî derbarê tecrîda giran ya ser Rêber Apo wiha got: “Dewleta Tirk naxwaze mafê jiyanê bide felsefeya Rêber Apo. Ji ber vê yekê, ew dixwaze jinan tune bike. Rêber Apo bi qasî 24 salan di bin tecrîdeke giran a dewleta Tirk de



ye. Ew li Îmraliyê ye, lê giyanê me her dem bi wî re ye. Em bi felsefeya wî dijîn. Divê dijmin baş bizane ku kes nikare me ji felsefeya Rêber Apo qut bike. Heya ku Rêberê me azadiya fîzîkî bi dest nexe, em jin nikarin azad bibin. Azadiya Rêber Apo azadiya jinan e.”

# ’Nerwroz ji bo jina Kurd Roja vejînê ye’

**Norşîn Sîno\Qamişlo**

**Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku Newroz ji bo jinan tê wateya vejînê û gotin, Newroz ji bo gelê Kurd û bi teybet jina Kurd, roja bilindkirina asta têkoşînê ye. Herwiha dan zanîn ku Newroza 2023’an wê bibe Newroza azadiya Rêber Apo.**



Li gorî Mîtolojiya Kurdan, di roja 21`ê Adarê de Kawayê Hesinkar dawî li Dehaqê ku li ser Kurdan zilm dikir û ciwanên wan di kuştin, anî. Lewma Ev roj ji bo gelê kurd bû roja azadî û vejînî. Herwiha ji wê dîrokê û heta niha gelê Kurd vê rojê pîroz dike. Di heman demê de ev roj ji bo jinên Kurd jî rojeke pir pîroze û watedar e.

Jinên bajarê Qamişlo ji me re axivîn û dan zanîn ku ewê bi rihê dirûşmeya ’‘Jin Jiyan Azadî’ Newroza 2023’an pêşwazî bikin.

Gulîstan Ibrahîm ya ji bajarê Qamişlo Newroza 2023’an li Rêber Abdullah Ocalan û tevahiya gelê Kurd pîroz kir û got: “Em Newroza 2023’an li Rêber Apo û şehîdên Tevgera Azad pîroz dikin. Bi saya têkoşîna Rêber Apo û Tevgera Azadiyê em îro li Rojavayê Kurdistanê Newrozê Pîroz dikin. Nerwoz ji bo jina Kurd rojeke pir pîroz e, ev roj ji rojên salê teva cûdatir e. Roja vejîna Kurdan e. Ji ber wê her sal ji bo pêşwazîkirina Newrozê em beriya bi mehan amadekariyên xwe dikin.”

### Tekoşîna li dijî Dehaqên serdemê

Gulîstan da zanîn ku jina Kurd bi rihê agirê Newrozê, herwiha bi fikrên Rêber Apo meşa azadiya jin dewam dike û wiha domand: “Em jinên kurd xwe di Newrozê de dibînin û hestên pir mezin tê de hîs dikin. Em fikr û felsefeya Rêber Apo û bi têkoşîna azadiya jinê berbi lûtkeyê ve dibin. Em ê îsal jî bi rihê agirê Newrozê, bi felsefeya Rêber Apo meşa azadiya jinê dewam bikin.”



Gulistan diyar kir ku tekoşîne wan tekoşna li hember Dehaqên zalim yên xwîna gelan dimêjin e û teqez kir ku Rêber Apo tekoşîna Kawayê Hesinkar ji bo hemû gelan mezin kir û ewê jî li du vê tekoşînê biherikin.

Gulîstan Mihemed da zanîn ku ew hêvî dikin ku Newroza 2023’an bibe Newroza azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û axaftina xwe wiha qedand: “Ez bi hêvî me û hêviyamin pir mezine ku em di Newroza 2023’an de Rêber Apo fîzkî azad bikin û şoreşa jinê bi serbixin.”

### ‘Newroz bêhna azadiyê ye’

Jina bi navê Rojîn Elî jî derbarê Neweozê hestên xwe yên kêfxweiyê anî ziman û got: “Bi hatinê Newrozê pir kêfxweşim. Newroz roja hebûna gelê Kurde û bi taybet jina Kurd e. Beriya Şoreşa Rojava me nikarîbû Newroz eşkere pîroz bikin, herwiha rêjîmê gelek astengî ji me re derdixistin. Lê niha bi saya xwîna şehîdan û



têkoşîna jinê em Newrozê bi azadî pîroz dikin. Ez hêvî dikim ev newroz bibe Newroza azadiya Rêber Apo û gelê Kurd.”

Rojîn derbarê amadekariyên ji bo pêşwazîkirina Newrozê wiha got: “Beriya Roja 21’ê bi 10 rojan em hazirtiya vê roja girîng dikin. Newroz hestên berxwedanê xurt dike û em bêhna azadiyê digirin.”


Rojîn Elî diyar kir ku ew bi hêvîne Newroza 2023’an bibe Newroza azadiya Rêber Apo û axaftina xwe woiha qedand: “Em bi hêvî ne ku Newroza me bibe Newroza azadiya Rêber Apo, herwiha gelê Kurd bighêje azadiyê.”



# Nexweşname

**Mizgîn Ronak**

**Loma jî kuxte-kuxta min zûda bi ser a pirtûkên min û we ketiye û dinya xira kiriye. Ji lewre ez niha ji nav kavil û xirabeyên kuxte-kuxtê û ji kuxte-kuxta xirabe û kavilê destên xwe ji we re dihejînim**



Wek tevî pirtûkên Kafka a wî ya bi navê ‘Doz’ jî gelek balkêş û di warê xwe da bê hempa ye. Mînak; di tevî pergela hiqûqê de yan mirov bi sûc û ji sûc digihîje bersûc û sûcdar; an jî bersûc û sûcdar mirov dibe ba sûc! Belam di Doz’ê de bersûcê belengaz, bi fîxan û hawar li sûcê xwe yê nexwiyayî li sûcê xwe yê ku tenezul nakin jê re jî bibêjin digere…Û em jî pê re… Lê belê ‘em’ digerin nagerin,’sûcê xwe’ nabînin û pirtûk diqede! Îja niha, di vê nîvroya min û we ya hinek bêmirûz da mebesta min ne ev e ku behsa-her çiqas min bi wê dest pê kiribe jî- Kafka yê ezîz lê behsa geryana xwîner û nivîskarên kurd a li hev bikim.

Lew li gorî min ew jî dişibe ‘geryana’ Kafka. Teva ku ne nivîskarî û ne jî xwînerî ‘sûc’e (gerçi ger kurdî be li gorî hinekan dibe ‘sûc’ lê mijar niha ne ev e) û rewşek’crîmînal’ li holê tine jî geriyan, lihevgerîn û hevnedîtineke ecêb û elewat; ku bi aliyên xwe yên trawmatîk, kaotik û nexweşok dişibe ‘rewşên’ kafkaesk heye. Wisa ecêb û elewat û kafkaesk e ku, ev geryan; êdî bûye negeryan û çav çavan nabînin…Herçî çerxa kirêt û kujer a asîmîlasyon û oto-asîmîlasyonê ye, naxwazim behs jî bikim. Lew ew wext zû da derbas bû! Êdî gere em bibin keştî (geşte) ne ku behsa keştiyan bikin. Jixwe hebûnek kirdeyî ya ku em hem hez û hem jî heq dikin, pêkhatinek wisa ji me dixwaze, ne welê?

Helbet hin nivîskar û xwînerên me yên ji halê xwe gelek memnûn û razî jî hene ku em ji wan re tenê dikarin bêjin noşîcan be! Lê belê bi qasî ku ez dibînim, rewşeke ku mirov pir pê şad û bextewar be jî nîn e. Di nav toz û tubara dem û serdemê de xwîner an tî û birçî digere yan jî qudûma gerê pê re nemaye. An çi dikeve ber çavên wî/ê dixwîne, yan nizane ku çi dixwîne, yan jî bi tiştên ku dixwîne; bi jana zirav ketiye û her roj, bêyî ku haya wê/î jê çêbe, zirav zirav dimire! Herçî nivîskar e, ketiye dilqê(şekle) xeyalatan û di şevên ronî û rojên tarî de bi çîrokek deryaza ya ku di tora masîvanekî rûtirş da diperpite, re direqise. Em dikin û nakin çavên wê/î me nabînin. Em dibêjin;’ nivîskar/hozan, em jî wek te li vî welatê ku ji toza sehraya xembariyê çêbûye bi pey reqsa bi çîrokeke deryaza ya nîvmirî re ketine…Em jî wek te ne, em jî wek te ne…’Belam nivîskar me nabîne û nabîhîze. Û nivîskar li xwîner, xwîner li nivîskar digere. Lê kes kesî nabîne.

Îja gelî nivîskar û xwînerên kurdî yên heta bêjî tendurust, nexweş û hêja! Em komele û partiyên neçarî û nexweşiyê vekin çi bikin? An li hember xwe û vê hevnedîtinê cengê îlan bikin? Lew em mikur neyên û xwe bi heft avan bişon jî di vê babetê de rengê me zer û zerhimî, destên me lerzok, çavên me melûl in. Tu berçavk û makyaja nixamtinê nikare wan veşêre.

### Kuxte-kuxta xirabe

Herçî pirtûk in, ji ber û ji bo nexwşiya xwîner û nivîskar, bi kuxtekuxtê ketine. Guh ji xwe jî birin ji me jî. Her wiha ez jî wek gelek ji we du caran bi jana zirav ketime! Lew hem xwîner hem jî nivîskar-hozanek kurdî me. Loma jî kuxte-kuxta min zûda bi ser a pirtûkên min û we ketiye û dinya xira kiriye. Ji lewre ez niha ji nav kavil û xirabeyên kuxte-kuxtê û ji kuxte-kuxta xirabe û kavilê destên xwe ji we re dihejînim. Belam dem dema bûyîna bi dîtinê be jî, (ku tu li dinyaya dîjîtal neyê dîtin, tu nîn î!) divê hûn min nebînin. Ji ber ku dîtin, hê jî sihrê betal dike, em înkar bikin û demode bibinin jî wiha ye.

Dibe ku niha hin dengên hêja û bilind wiha bêjin; ’De heyra lihevgerîn û hevnedîtina çi, xwîner, nivîskar û nexweşê çi, kavil û sihra çi?! Em baş û ji halê xwe memnûn in, pispor û feylesofê her tiştî ne! Tu ya biyan, tu ya ku ji dojeha muebed hatî, behsa çi dikî!’

Rast e ez biyanek im, biyanek ku evîndara welatekî xeyalî bû; welatekî ku niha piştî deh umran lê digerim û dibêjim; ’tu li ku yî welato!’Lê belê nivîskar û xwîner dîsa jî nexweş e û ez û win jî pê re…

Belê, nalenala NEXWEŞÊN ME digihîje asîmanê heftan. Stêrk digirîn, bager û bahozên nerabûyî dilorînin, dem û dewranên gul û nêrgizan xwe diperitînin. Lew ne xwîner xwîner e, ne jî nivîskar nivîskar e! Her du li hev digerin lê hev nabînin. Her ku li hev digerin, ew qas ji hev dûr dikevin. Gelo li hev nagerin? Belkî wisa sertije û bargiran in ku nikarin û nizanin li hev bigerin.Û haja wan ji pêwistiyeke wisa tune jî…Lê dîsa jî li hev geryan û gihiştin lazim e. An na dê ev jana zirav û kesera kûr me li bin guhên sibehên ku zûda bûne par bixîne. Û dê ev kuxte-kuxt, ey keştiyên delal ên ku li bendergehên winda asê mane; dê me li ber deriyê Raskolnîkov li erdê dirêj bike! Ma ne wexta birêketinê ye. Bila bahoz li paşila me, bendergeh li pey me, gihîştina bergeha xwîner û nivîskar dilşadiya me be! Bila şalûl bi ser me de bistrên; nexweşî nema, nexweşî nema…

**Çavkanî: Xebûn**

# Rojên şên ên Helebce

**“Divê bajarek tenê bi qetlîman neyê bibîranîn. Naxwe civaka li wir nikare li rabuhiriyê jî vegere û siberojekê ji xwe re ava bike. Lewma divê mirov karibe hin hêlên baş jî bibîne û li wan rojên xweş ên li Helebceyê vegere.”**

Helebce bajarekî çawa bû, beriya ku komkujî li wir biqewime xelkê li wir çi dikirin û bi çi re mijûl dibûn? Bajarê ku îro bi komkujiyê tê bibîranîn, xwedî rabuhiriyeke çawa bû?

Saziya “Gulan” sala 2009’an li Ingilîstanê hatiye damezirandin. Wê derbarê rabuhiriya Helebceyê de xebateke weke arşîvê di sala 2020 û 2021’an de bire serî. Saziya Gulanê bi projeya “Halabja: In the Golden Days” (Helebce: Di rojên zêrîn de) tevlî “Journey’s Festival International” dibe. Ev festîval nexasim ji bo penaber û xelkên koçber tê organîzekirin û cih dide xebatên afirîner ên hunermendan. Saziya Gulan jî bi projeya xwe pêşangehekê organîze dike û di pêşangehê de cih dide hunermend, nivîskar û muzîkjenên Kurd ên Helebceyî.



### Helebce, bajarê helbestkaran

Di çarçoveya pêşangehê de performansên hunerî, helbest û fotografên beriya sala 1988’an ango beriya komkujiyê tên nîşandan. Proje hewl dide bikeve pey rabuhiriya Helebceyê û rojên beriya komkujiyê nîşanî xelkê bide. Ji lewma jî pêşangeh derheqê Helebceyê de di heman demê de xebateke hafize û arşîvê bû. Derbarê dîroka Helebceyê û her wiha rêûresmên wê de xebateke taybet derketiye holê. Lêkolînên li ser rabuhiriya Helebceyê nîşan didin ka bajarê Helebceyê çiqas rengîn û xwedî çandeke dewlemend bûye. Ji lewma beriya komkujiyê, Helebce weke “bajarê helbestkaran” dihat bibîranîn. Projeya bi navê “Halabja: In the Golden Days” di heman demê de weke kovarekê jî hatiye hazirkirin. Li gel xebatên wêne, bibîranîn û fotografên arşîvê, behsa helbestkarên Helebceyî jî dike. Abdulla Goran, Ehmed Begî Caf û Tahir Begî Caff çend ji wan helbestkarên Kurd in ku di kovarê de cih digirin.

### Ji bilî kîmyabaranê jî dîrokeke Helebceyê heye

Saziya Gulan bi vê projeya xwe dixwaze kesên Helebceyê bi dîroka bajar re ji nû ve têkiliyekê ava bikin û bi saya vê têkiliyê rojên zêrîn ên Helebceyê bi bîr bînin. Ji lewre, ew didin zanîn ku bûyerên weke Enfalê nasnameya kolektîf a Helebceyê jî ji holê rakiriye. Saziya Gulan jî bi vê projeya xwe dixwaze xelkên Helebceyî, nexasim jî yên ku ji Kurdistanê koç kirine û niha li dîasporayê dijîn dîrok, nasname û çanda xwe bi bîr bînin, ango herin wan rojên xweş û zêrîn; “Li Rojhilata Navîn ji xeynî serpêhatiyên şer kes behsa tiştekî nake. Bêguman li Helebceyê jî komkujiyeke mezin çêbû. Lê divê bajarek tenê bi qetlîman neyê bibîranîn. Naxwe civaka li wir nikare li rabuhiriyê jî vegere û siberojekê ji xwe re ava bike. Ji lewma jî divê mirov karibe hin hêlên baş jî bibîne û li wan rojên xweş ên li Helebceyê vegere. Ev yek dê bike ku mirov baştir bibe û bîra dîroka welatê xwe bibe.”

### Wêneyên rojên şên ên Helebceyê

Saziya Gulan ji bo arşîva di kovarê de kom bike, pirr lêkolîn kirine. Lewma tevî komkujiyê winda dibin û xelk bê hafize dimîne. Lê kovarê dîsa jî xwe gihandiye gelek wêneyên beriya komkujiyê. Ji wêneyên koma şanoyê ya yekem a Helebceyê, heta bi tîma futbolê ya Helebceyê û koma muzîkê dane hev û bi gelek kesan re peyivîne. Wêneyên beriya komkujiyê nîşaneya rojên xweş ên Helebceyê ne. Jixwe, yek ji damezirînerê saziya Gulan jî Marîwan Celal e. Ew bi xwe ji Helebceyê ye. Wî jî di vê projeyê de hem karê wergerê kiriye û hem jî bi karên xwe yên hunerî cih girtiye. Wî bi kolaj û metaryalên arşîvê çanda li Helebce nîşan daye. Her wiha berhem û koleksiyonên hunermendên din jî wan rojên zêrîn ên geş û ronî yên Helebceyê tînin bîra xelkê.

**Çavkanî: Ozgur Politika**

# Rewşa kargehên savarê li bakur û rojhilatê Sûriyê

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Kargehên çêkirina savarê, ji bo peydakirina hewcedariya welatiyan tevî rûbirûbûna astengiyan kar dikin. Hevserokê ofîsa pêşesaziyê Hisên Usman jî got, em bi hemû derfetan hewl didin pêwîstiya herêmê ya bi savarê peyda bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**



Di dema dawî de Herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê di warê pîşesazî de bi pêş ketiye. Herwiha gelek herêmên cuda yên Rêveberiya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê kargehên cûda vekirine. Di nav wan de gelek kargehên savarê jî hene. Ev kargeh hem derfetên kar ji hezarên mirovan re peyda dikin, hem jî hewcedariya gel ya savarê pêşewazî dike.

7 kargehên savarê li bakur û rojhilatê Sûriyê hene (kargeha El Cizîre, Rafîdên, Cûdî, Selam, Nehrên, Firat, Faxir û Baz).

**Jimara karkeran û rêjeya hilbirînê**

Hejmara karkeran di her kargehekê de ji 30 heta 50 karker û karmendan heye. Herwiha rêjeya hilberînê ya her kargehê, li gorî kar û xebata wê ye. Eger her tişt peyda be, kargeh bi rêjeyeke hilberînê ya bilind û hejmareke zêde kar dike, heta ku di mehê de nêzî hezar ton savar çêdike. Lê dema ku madeya genim kêm be û kerebe tinebe, di mehê de karheh nêzî 500 ton savar çêdike.

**Cûre û qalîteya savarê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê**

Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê li gorî cureya genim û awayê hilberîna wê, savar li ser du cûreyan tê dabeşkirin. Cûreyek jê rengê wê zer e, ya duyemîn jî rengê qehweyî ye, ku ji savara zer nermtire. Lê herî zêde savara zer di nava gel de tê bikaranîn. Dema ku dikeve hilberînê. Ji bilî renê wê jî sê beşên savarê wek, savara girs ya navîn û ya hûr hene.

**`Em bi hemû derfetan hewl didin pêwîstiya herêmê ya bi savarê peyda bikin`**

Derbarê rewşa kargehên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê yên savarê Hevserokê Ofîsa Pîşesaziyê li bakur û rojhilatê Sûriyê Hisên Usman, ji me re axivî û di destpêka axaftina xwe de behsa hevdîtinên vê dawiyê yên bi xwediyên kargehên savarê re kir û got, dema dawî ji bo naskirina pirsgirêk û zehmetiyên ku kargeh pê re rûbirû dimîne e, me civînek bi xwediyên kargehên savarê re çêkir. Di civînê de diyar bû ku ew zehmetiyan di milê peydakirina elektirîkê û genimê hişk de dikşînin. Em bi hemû derfetên xwe kar dikin û hewl didin pêwîstiya herêmê ya bi savar peyda bikin. Herwiha aboriya herêmê bi pêş bixin.

Hisên di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Berhemê savarê yê ku ji aliyê kargehên me ve tê hilberandin, têra pêwîstiya welatiyan nake. Ji ber wê jî em mehane ji 600 ton heta 1000 ton savar ji derve werdigrin, lê dîsa jî pêwîstî bi berhemeke zêdetir heye. Wergirtina savarê ji derveyî herêmê wek pîvaneke ji bo peydabûn û hewcedariya bazarê ye. Hin caran wergirtina ji derve jî bi dest me nakeve. Lewra gelek caran rê û deriyên cûnhatina yên navbera herêmên me û yên derve de girtî ne.”

**`Divê hilberîna xwecihî û ya ji derve zêdetir bibe`**

Hisên bal kişand ser savara ku ji derve tê wergirtin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Savara ku ji derve tê wergiritn biha ye û zêde daxwazî li ser nîne. Pêwîstiya welatiyan ji rêjeyê ku tê çêkirin zêdetir e û divê hilberîna xwecihî û ya ji derve zêdetir bibe. Divê her mehê du hezar ton savara herêmî û ya derve were peydekirin. Herwiha pêwîste serjimariyeke li ser hejmara wlartiyên herêmê hebe û rêjeya hilbirênê ya her kesekî diyar bibe. Li se vê bingehê wê rêjeya madeyê û asta hibirînê were diyarkirin.”

**`Divê qada zeviyên çandiniya genim zêdetir bibe`**

Hisên got, ji bo ku em berhemeke baş ji savarê bi dest bixin, divê destpêkê em di warê ewlekariya xwerekî de bi pêş bikevin. Ango sîstema dewreya çandiniyê pêk bînin û qadên çandiniyê kêm bikin. Herwiha zevî bi Tiştên nepêwîst neyên çandin û qanûnek ji bo kesên ku van rêbazan binpê dikin, were danîn. Da ku qada zeviyên çandiniyê ji bo çandiniya genimê hişk zêdetir bibe. Çêkirina ambarên nû ji bo komkirina genim û zêdekirina rêjeya wê. Herwiha dabînkirina piştgiriyeke tam û dabînkirina hemû pêwîstiyên kargehên savarê ji madeyên xam û enerjiyê. Da ku tevayiya kargeh ji nû ve bikevin xizmetê û rêjeya hilbirîna xwe zêdetir bikin.


**`Divê em genim bi taybetmendîyên bilind biçînin`**

Hisên wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ji bo ku em di berhemanîna savarê de rêjeyeke baş bi dest bixin, divê çend faktor hebin an jî stratejiyek diyarkirî were sepandin. Di destpêkê de li gorî Hilberîna genim were sepandin. Herwiha divê em genimê hişk bi taybetmendîyên bilind ji tovên baş û taybetmendîyên baştir biçînin û zeviyên ku bi genimê hişk tê çandin zêdtir bikin. Em tev dizanin ku piştî Şoreşa Rojava li Bakur û Rojhilatê Sûriyê asta çandiniyê lawaz bû. Ji ber rawestana kar û barên bendavan, rûbara rêjeya gelek zeviyan kêm bû, ev jî rêjeya berhemanîna genim kêm kir. Bi vî awayî genimê ku di ambaran de tê komkirin kêm bû û bû sedem ku piraniya kargehên savarê werin rawestandin û karkirina hin kargehan bi berhemên kêm. Kêmbûna genim bandorê ne li kargehên savarê tenê li gelek kargehên din yên girêdayî genim çêbû.”

**`Divê em xwe bispêrin karêgehên nû û pêşketî`**

Hisên derbarê pêşxistina xebata di warê hilberîna savarê de ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Divê em xwe bispêrin karêgehên nû û pêşketî û xwe ji rê û rêbazên berê yên hilberîna savarê dûr bixin. Dema berê welatiyên li gundên li ser destên xwe savar çêdikirin û bi awayekî kevneperest û seretayî, genim di amûra wê de hûr dikirin û bi destan dihêrin. Lê bi pêşketina zanist û pîşesazî re, welatiyên gundan jî êdî berê xwe didin savara hazir ya kargehan. Ev jî asta pêwîstiyê zêdetir dike û hilbirîneke zêdetir dixwaze.”

Hisên behsa taybetiyên ku pêwîste di savarê de hebin kir û wiha pê da çû: “Niha di warê hilberîna savarê de kargehên nûjen û pêşketî yên ku xwe dispêrin şêwazên nûjen yên hilberîna savarê li herêmên me çêbûne wek kargehên El Cizîre, Rafîdên, Cûdî, Nehrên û Baz ku ji kargehên nûjen û stratejîk yên hilberîna savarê têne hesibandin.”









**Astengiyên ku kargehên savarê rastî wan tên**

Hevserokê Ofîsa Pîşesaziyê li bakur û rojhilatê Sûriyê Hisên Usman di dawiyê de astengî û zehmetiyên herî girîng yên ku kargehên savarê li bakur û rojhilatê Sûriyê rastî wan tên anî ziman û got, yêk ji van astengiyan, kêmbûna genimê hişk e. Lewra piraniya zeviyên çandiniyê bi genimê nerm yê ji bo hilberîna nan tê çandin. Ji bilî kêmbûna genim, nepeydekirina elektirkê ji bo kargehan jî astengiyeke mezin e. Herwiha zehmetî di milê peydekirina kîsên naylon yên savarê û hin pêdiviyên girêdayî kar û xebata xargehê de tên kişandin. Lê tevî van astengiyan karger heta astekê hewcedariya gel ya bi giraê peyda dike.



# YPG: Bi ruhê fermandar Karker em ê Efrînê rizgar bikin

**Navenda Nûçeyan**

**Di salvegera 5`an a şehadeta fermandarê Berxwedana Serdemê Karker Êrîş de, Fermandariya Giştî ya YPG’ê soza bidawîkirina dagirkeriyê li Efrînê nû kir.**

Femrnadariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG) di salvegera 5`an a şehadeta fermandarê Berxwedana Serdemê Karker Êrîş de daxuyaniyek weşand.




**’Gelê Kurd li ser felsefeya Rêber Apo tekoşîn dan meşandin’**

YPG’ê diyar kir ku gelê Kurd ev sed sale di bin zext û zordariya çar dewletan de ye û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker dijminekî sondxwarî yê gelê me ye. Ji bo ji holê rakirina hebûna gelê Kurd, tiştekî ku nekir nema. Ji qirkirina fîzîkî bigre heya bi qirkirina çandî, siyasî û psîkolojîk, bi rê û rêbazên herî hovane êrîşî rastiya gelekî ku li hebûn û azadiya xwe digere, kir. Lê li hember van hemû zext û êrîşên qirkirinê gelê Kurd li ser felsefeya Rêber Apo bi keç û xortên xwe yên egîd re tekoşîneke bê eman dan meşandin. Ev tekoşîn, tekoşîna hebûn û azadiyê ye.”

YPG’ê da xuyakirin ku di vê meşa giranbiha a têkoşîna wan ya azadiyê de gelek leheng derketin, her yek ji van lehengan ji bo gelê xwe bûn sembol û mohra xwe li dîrokê dan û wiha domand: “ Ji xwe nîşaneya civakeke azad jî derketina kesayetên ku xwe fedayê civaka xwe kirine. Fermandarê cengên giran, rêheval Karker, yek ji wan lehengan e ku ji nav rastiya gelê xwe yê şerker û azadîxwaz derketiye. Ji wê ye ku heya hênaseya xwe ya dawî bê teredut, bê ku yek gav paşde bavêje, canê xwe li hember hêzên dagirker kire mertal.”

**’Şervanên me mohra xwe li destana Serdemê dan’**

YPG’ê da zanîn ku Rêhevalê wan Karker wek fermandarekî YPG yê dilsoz, bi bîr û baweriyeke mezin li hemberî duyemîn artêşa NATO, heta li hemberî teknîka giran a NATO bi xwe mil bi mil li gel şervanên xwe şer kir û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker tevî komên xwe yên çete û bi desteka mezin a NATO’yê êrîşê bajarê Efrînê kir. Di wateya rasteqîn de şervanên me yên YPG’ê bi pêşengiya Fermandar Karker û Fermandar Rosyar de mohra xwe li destana Serdemê dan. Bi vê lehengiya xwe gelê me yê Efrînê ji êrîşên qirkirinê parastin, erk û berpirsiyartiya xwe ya şoreşgerî bi cih anîn. Di vê wateyê de fermandar karker bû mînaka xeta serketinê ya serdema nû.”

# Serhildana’ Jin Jiyan Azadî dewam dike

**Navenda Nûçeyan**

**Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê bi hemû hêza xwe û bi çalakiyên cûda dewam dike. Tevî ku rêjîma li hemberî serhildêran şidet , işkence û kuştinê jî dike, lê serhildan bi biryardariyeke mezin dewam dike**



Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê bê navber dewam dike, Tevî ku rêjîma Îranê li hemberî serhildêran kuştin, girtin û işkencekirinê jî dike, lê xwepêşandan dewam dikin û gel li dijî kiryarên rêjîm dengê xwe bilind dike.

Di çarçoveya serhildana gel ya li dijî rêjîma Îranê, di 17’ê Adarê de piştî nimêja Înê li bajarê Zahîdan gel daketin qadan û çalakî lidarxistin. Di çalakiyan de welatiyan diyar kirin ew ê hate dawî serhildanê bidomînin. Di çalkiyê de çalakvanên pankartên cûda yên li dijî rêjîmî bilind kirin. Li gorî agahiyan tevlîbûna jinan ya ji çalakiyan re zêde bû.

Di heman demê de çalakiyên li Rojhilatê Kurdistanê bi şêwazên cûda dewam dikin, di 17’ê Adarê de li çend bajarên Seqiz, Dêwlan komek çiyager berê xwe dan çiyayên Rojhilatê Kurdistanê. Çiyageran diyarkirin ku heya serhildana ‘Jin, Jiyan, Azadî’ biserkeve, ewê çalakiyên xwe dewam bikin. Çalakvanan girê Newrozê pêxistin û li ber govend gerandin.

# Dîsa bi çekên qedexe êrîş kirin

**Navenda Nûçeyan**

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê ragihand ku Artêşa Tirk a dagirker bi çekên qedexe êrîşî çeperên berxwedanê yên li qada Çemçoyê kirin.**



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê bi daxuyaniyekê êrişên artêşa tirk yên bi çakên qedexekirî wiha ragihandin:

“Di17’ê Adarê de çeperên me yên berxwedanê yên Çemçoyê bi çekên qedexe carekê hatiye bombekirin.

Di 17’ê Adarê de çeperên berxwedanê yên Çemçoyê, Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî û qadên Golka û Girê Çarçêl ên Metînayê bi balefirên şer 4 caran hatine bombekirin.


Di 16 û 17’ê Adarê de çeperên me yên berxwedanê yên li Qada Girê Ortê ya Metînayê, Qada Berxwedanê ya Girê FM û yên li qada Çemço û Sîdayê bi obus, hawan, tank û çekên giran 73 caran hatine bombekirin.”

# Derbarê Pûtîn de biryara girtinê hate dayîn

**Navenda Nûçeyan**

**Dadgeha Ceza ya Navnetewî, derbarê Serokê Dewletê yê Rûsyayê Pûtîn de biryara girtinê derxist û got, Ji bo lêpirsîn baştir were meşandin û mexdûr bên parastin, biryara girtinê ya derheqê Pûtîn de divê eşkere bi raya giştî ve bê parvekirin.**

Dadgeha Ceza ya Navneteweyî (UCM) derbarê Serokê Dewletê yê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn de ji ber sûcên şer biryara girtinê derxist. Di daxuyaniya li ser malpera înternetê ya UCM’yê de hat ragihandin ku lêpirsîn baştir were meşandin û mexdûr bên parastin, biryara girtinê ya derheqê Pûtîn de bi awayekî veşartî dihat nirxandin.



Girêdayî wê da zanîn ku eger ev yek ji raya giştî re bê aşkerakirin, ji ber gengaziya pêşîgirtina li sûcên bi heman rengî yên di dema pêş de, tê xwestin biryar bê eşkerekirin.

Di nava sûcdariyên ku UCM arasteyî Pûtîn dike de, veguhastina derqanûnî ya hin zarokên ji Ûkraynayê ber bi Rûsyayê ve dibe, heye.

Dadgehê, ji ber vê yekê derbarê Komîsera Mafên Zarokan a Rûsyayê Maria Alekseyevna Lovova-Belova de jî biryara girtinê derxist.

Hejayî bîranînê ye ku Rûsya, şerê di 24’ê sibata 2022’yan de li dijî Ukraynayê daye destpêkirin, didomîne.

# Dagirkeriyê 'Efrîna Aşîtiyê' veguherand navenda sûcan

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê di nava 5 salan de bi hezaran sûcên giran li dijî gelê Efrînê kirine. Efrîna ku bi navê bajarê aşîtiyê û demokrasiyê dihat nasîn, îro ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve veguherand navenda sûcên dij mirovî.

**Mihemed Xanim /Qamişlo**









Di sala 2011'an de kirîza Sûriyê dest pê kir, li tevahiya herêmên Sûriyê valahiyeke ewlehiyê derket û alozî bi ber kûrbûnê ve çû. Li Rojavayê Kurdistanê gelê Kurd bi pergala Rêber Apo xeta sêyemîn hilbijart. Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li bajarê Kobanê serhildana gel ya li hemberî rêjîmê dest pê kir. Gel hêzên xwe yên leşkerî û siyasî ava kirin û pergala xwe ya demokratîk a wekhev û azad saz kir. Ev pergala xweser li ser bingeha paradigmeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêş ket.
Li aliyekî êrşî û li aliyê din jî dorpêç Dewleta Tirk a dagirker wekî her car bi tevahiya hêza xwe hyewil da ku têkoşîna gelê Kurd têk bibe û aloziya Sûriyê li gor xwina xwe ya Osmaniya nû, bikar bîne. Ji ber wê, ji destpêka aloziya Sûriyê ve destek da komîn çete yên radîkal yên Islamî û berê wan da Rojavayê Kurdistanê. Çeteyan Cebehet Alnusra û Alqaîde, bi ferman û destekdayîna dewleta Tirk êrîşî herêmên Rojavayê Kurdistanê kir. Li aliyê din jî rêjîma Sûriyê herêm dorpêç kir. Lê armanca dagirkeriya Tirk û hikumeta Şamê pêk nehat. Gelê Rojava li dijî hemû êrîş û dorpêça li ser xwe, xwe bi rêxistin kir û parastina cevherî pêşxist.

DAIŞ'ê bi femana Tirkan êrîş kir

Li hemberî destkeftiyên Rojava, dewleta Tirk a dagirker kêliyekê ranewestiya, vê carê li pêş çavên cîhanê çeteyên DAIŞ'ê ji tevahiya cîhanê kom kir û ew derbasî Sûriyê kirin . Bi belge û tesbîtan, Tirkiyê çekên giran radestî çeteyan kir û di tevahiya aliyan de alîkariya wan kir. Careke din bi fermana dewleta Tirk ,çeteyên DAIŞ'ê ku artêşên wekî Artêşa Iraq û Sûriyê xwe li ber negirt, êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir. Lê bi saya Gerîlayên azadiyê ku wekî volkanê ji çiyayên azad herikîn û ji bo parastina gel berê xwe dan Rojava, herwiha bi pêşengiya YPG'ê û YPJ'ê êrîşên DAIŞ'ê têkçûn.

Tirkiyê xwest tola DAIŞ'ê rake

Ji ber têkçûna çeteyên DAIŞ'ê, dewleta Tirk bi hêrs bû û bi komên çeteyan, di 20'ê Çileya 2018'an de bi hejmareke mezin ji balafirên şer, tang, mûşek û tevaiya çekên giran yên ku ji NATO'yê digre, êrîşê herêma Efrînê kirin. Piştî 58 rojan ji berxwedaniyeke dîrokî ya gel, Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a faşîst û komên çete yên girêdayê wê ve, hat dagirkirin. Di encama êrîşên dagirkeriyê de bi dehan malên welatiyan, dibistan, avahiyên fermî, nexweşxane, mizgeft, cihên dîrokî û pîroz jî, hatin wêrankirin. Tevî ewqas hêz û teknîkê jî, şervanên YPG-YPJ'ê û gelê Efrîn ê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî berxwedaneke dîrokî nîşan dan û bi pêş 58 rojan nehiştin ku dagirker bikevin nava bajêr. Lê ji ber êrîşên qirkirinê şervanan, gel ji bajar derxistin û di 18'ê Adara 2018'an de Efrîn hat dagirkirin.

**Kiryarên dagirkeriyê bênavber didomin**

Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û heta niha, kiryarên dijmirovî yên dewleta dagirker ya Tirkiyê û çeteyên wê ku li ser gelê Efrînê didin meşandin, bênavber dewam dikin.

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê , piştî dagirkirina Efrînê û heta niha, dagirkeriya Tirk û çeteteyên wê zêdetirî 665 welatiyên Efrînê kuştin e, ji wan jî 97 jin in. Herwiha li dijî 71 jinan destdirêjî hatiye kirin û 213 jin di bin tundî û îşkenceyê re derbas bûne û zêdetirî 10 zarokan hatine kuştin.

**Li Efrîn guhertina demografîk bi lez birêve diçe**

Li gorî amarên fermî ji ber êrîşên dagikeriya Tirk zêdeyê 300 hezar welatiyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin û li herêma Şehbayê xwe di nava kampan de bi cih kirin. Piştî dagirkirina Efrînê û valakirina wê ji gelê wê yê resen, dagirkeriyê nêzî 400 hezar ji Erebên Xûtaya Şamê, parêzgeha Idlibê û navçeyên cuda ên Sûriyê li Efrînê di mal û milkên Kurdan de bicih kirin û demografiya Efrînê didin guhertin. Herwiha li gorî amarên fermî zêdeyî 30 kampên mitîngeriyê li herêma Efrînê hatine avakirin, malbatên çeteyên ku bi kar têne û koçberên ji walatên cuda hatine bi cih kirin.

**Komên çete ji bo girtina pereyan kurdan direvînin**

Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve, dagirkeriya Tirk û çeteyên wê dest bi dizî û talankirina malan, dikan û avahiyên fermî, kirin. Herwiha kesên ku di Efrînê de man bi gefên dewleta Tirk û çeteyê wê re rûbirû man, bi armanca standina pereyan ji malbatên Efrînî bi hezaran xort û keçên Kurd ji aliyê komên çete ve hatin revandin û rastî eşkenceyan tên. Li gorî çavkaniyan ji 7 hezaran zêdetir welatiyên Efrînê hatine revandin û heta niha çarenûsa zêdeyê 2 hezar welatiyan ne diyar e.

**Xweza jî ji sûcên dagirkeriyê bê par nema**

Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ne tenê li dijî mirovan kiriyarên bê exlaqî dikin, herwiha li dijî ekolojiyê jî sûcên giran kirin û dikin. Dagirkeriyê ji destpêka dagirkirina Efrînê ve bi hezaran darên zeytun û mêweyan birîne. Herwiha bi 10 hezaran darên din ji bo firotinê hatine qutkirin. Li gorî ku hatiye tesbîtkirin milyonek û 300 hezar darên biber û bêber hatine birîn.
Hêjayî bibîranînê ye ku beriya dagirkirina Efrînê nêzî 18 milyon darên zeytûnan hebûn û salane 270 hezar ton zeytûn berhem dida.

**Dewleta Tirk deverên dîrokî yên Efrinê talan kirin**

Li kêleka dizî, kuştin, revandin, guhertina demografîk û xerakirina ekolojiyê jî, qirkirina çandî jî bi awayekî sistamatîk ji aliyê dagirkeriyê ve tê meşandin. Piraniya cihên şûnwarî yên Efrînê ji aliyê destê çeteyên tirkî ve hatîne talankirin û wêrankirin.
Li Efrînê gelek cihên dîrokî hene, Keleha Horî, keleha Samanê, Şikefta Duderî, Kenîseya Marmaron û bi dehan şûnwarên din. Nêzîkî 25 girên dîrokî hene, piraniya wan di ber çemê Efrînê re rêzkirî ne ku dîroka hinek ji wan digihe beriya zayînê 5 hezar salan. Piştî dagirkina Efrînê, piraniya wan bi makîneyên kar ve hatine kolandin û talankirin, hinek jî ji aliyê komên çetan ve kirine navendên leşkerî. Li gor Rêxistina Mafên Mirov, dagirkeriya Tirk û komên çete ji sedê 60'î zêdetir cihên şûnwarî, girên dîrokî û mezargehên olî, kolane û ji 20 hezaran zêdetir perçeyên entîka dizîne û ji bo Tirkiyê hatine şandin.

**Dagirkerî cihên olî û pîroz dike armanc**

Li Efrîn tu tişt ji terora dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê xilas ne bûn, heta ji cihên piroz jî tişt hatin dizîn û rûxandin. Wekî Ziyareta Şêx Elî li gundê Basûfanê ku hate vala kirin û tiştên di hundirê wê hatin xera kirin her wiha bi rûmeta gelê Êzîdî hat lîstin. Ziyareta Şêx gerîb ya li Gundê Sînka li navçeya Şera hate rûxandin. Ziyareta Qere Cirnê yê nêzî navçeya Meydankê hate ruxandin. Ziyareta Melek Edî li Gun Qîbarê hate rûxandin
Hêjayî gotinê ku di van 5 salên salên dagirkeriyê de, mirî jî ji kiryarên dagirkeriyê bê par neman. Çeteyên dewleta tirk ya dagirker, 4 goristanên şehîdan xirabkirin û goristana şehîdan a Avesta Xabûr jî kirin bazara ajalan.
Lê dîsajî di salvegera 5'an ya Efrînê gelê Efrînê û şervanên azadiya gel, soza rizgariya Efrînê da û li gor wê sozê jî tekoşîn bê navber didome.

## Newroza Mazlûm Dogan



Farûk SAKIK

Di bernameya min a di Stêrk Tv, Ewroj de nivîskar Fûat Kav mêvan bû. Mijar, Newroza Mazlûm Dogan bû. Fuat Kav, ew sal, ew roj, ew şev li wê zindanê bû. Bû şahidê çalakiya Mazûm Dogan ya fedaî.
Dewleta Tirk a dagirker ji dameziran-dina komarê ve dest bi dijminatiya kurdan kiribû. Di her serdemî de planeke wan a tunekirina Kurdan hebû.
Dema di sala 1978'an de PKK hat avakirin, ev konsepta wan a îmha û tunekirinê derbasî merheleyeke nû bû. Digotin; plana me ya salan ku êdî hêdî hêdî ber bi encamgirtinê ve diçû, tevgerek nû derket li pêşiya vê plana me û dibe asteng. Li dijî vê tevgerê êrişan dest pê kir û gelek pêşengên PKK'ê li zindana Amedê dîlgirtin.
Piştî demekê, darbeyek leşkerî. Li Amedê avakirina zindanek bi navê 5 Nolu. Anîna qontra û mazoşîstên wek Esat Oktay Yildirim. Ji bo tunekirina pêşengên PKK'ê ketin nav tevgerê. Zindan di demeke kurt de veguherî dojehê. Li dijî vê hovîtiya ku di dîrokê de emsalê wê tune bû, hemû rêyên berxwedanê hatibûn ceribandin. Bi tenê rêyek mabû ew jî bi mirina xwe jiyaneke nû afirandin bû. Ev nîqaş dihatin kirin.
Fûat Kav got; Hovîtî derketibû asta herî jor. Ji bo dawî anîna vê yekê em li rê û rêbazeke berxwedanê digeriyan. Li ser peyva fedaî dihat axaftin. Mazlûm ku firsend didît ji me re digot, heger di demê wiha de fadaî tunebin êdî di tu demî de wê bandora xwe tune be.
Di demeke wiha de rojek Newrozê li zindana Amedê di hucreya 35'an de, sibehê kesê ku xwarin belav dikir, di hucreya Mazlûm Dogan de 3 darikên niftikê dît. Lê Mazlûm nedixwiya. Piştî demeke li pişt perdeya hucrê rastî çalakiya wî ya fedaî hatin.
Fûat Kav di nirxandina xwe de digot, tukesî ji me texmîn nekir. Dojehek wisa bû, Newroz nedihat bîra tu kesî. Lê dema ku me 3 darikên niftikan dît, Newroz hat bîra me. Cûdabûna Mazlûm jî ev bû. Tiştên ku nehatibû bîra me, wî xwe li gor wê rojê amade kiribû.
Mazlûm Dogan, bi çalakiya fedaî starta berxwedana zindana Amedê da destpêkirin. Berxwedana zindanê bi ser ket. Peyamek da PKK'ê û PKK kongreya xwe kom kir, biryara vegera welat da. Peyamek da gel. Got, 'Newroz bi ruhê berxwedanê were pîrozkirin'. Gel her sal bi vê payamê dadikeve qadan. Lê em dîsa derbasî destpêkê bibin. Planên dijmin yên dîrokî û berxwedana îro; Piştî ku Mazlûm Dogan ev rih afirad, hemû pêlên êrişên yê tunekirinê û îmhayê vala derdikevin.

Êdî li her beşên têkoşînê, kurd bi rihê Newroza Mazlûm Dogan ber bi azadiyê ve dimeşin.
Îroj li Rojava sîstema rêveberiya xweser Kurdistanek azad heye. Îroj ji bo hemû destketiyên Kurdan biparêzin gerîla û şervanên leheng hene. Ev şervan û gerîla hemû êrişên dijmin vala derdixin.
Mazlûm Dogan bi çalakiya xwe ya fedaî bersiv da hemû demên raborî û pêşerojê.
Ev çanda berxwedanê ku wek 'Berxwedan Jiyan e' tê pênase kirin, li her qadên jiyanê ji aliyê mirovahiyê ve esas tê girtin.
Bi rihê Newroza Mazlum, Newroz pîroz be.



# 'Wê Efrîn ji destê dijminê nirxên mirovahiyê bê rizgarkirin'

Xwendekarên Zanîngeha Rojava ku ji bajarê Efrînê ne diyar kirin ku dewleta tirk dijminê nirxên mirovaiyê ye û teqez kirin ku wê bi têkoşîn û berexedanê, Efrînê rizgar bikin. Herwiha dan zanîn ku wê sûcên dijmirovî yên dewleta Tirk bê hesab nemînin.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**



Ji bo qirkirina gelê kurd û têkbirina projeya xuşk û biratiya gelan, dewleta Tirk û çeteyên wê di 20'ê Çileya 2018'an êrîşî herêma Efrînê kirin. Dagirkeriyê bi tevahiya çekên giran û pêşketî, herwiha bi hejmarek pir mezin ji çeteyan êrîş kir. Di êrîşan de bi 100'an welatî şehîd û birîndar bûn. Dagirkeriyê di êrîşên xwe de mal, dibistan, nexweşxane û binesaziya herêmê kir hedef. Li aliyê din YPG'ê , YPJ'ê û gelê Efrînê berxwedaneke dîrokî da. Şervanan li hemberî çekên pêşketî û giran yên dagirkeriyê, evsaneyên berxwedanê bi xwîna xwe nivîsandin. Piştî berxwdana bêhempa ya ku 58 rojan dewam kir, di 18'ê Adara 2018'an de Efrîn hat dagirkirin.
Dagirkeriya Tirk û çeteyên bi 100 hezaran, erebên ji deverên din yên Sûrî, herwiha malbatên çeteyan yên ji Iraq û welatên cûda, di malên welatiyên Efrînê de bi cih kirin. Di Efrînê de rêjeyeke pir kêm ya welatiyên resen mabû, ew jî rastî revandin, işkencekirin û kuştinê hatin. Dagirkeriyê li kêleka kuştinê jî, qirkirina çandî û xewzayî bilez meşand. Di encamê de bi dehan cihên dîrokî hatin dizîn û rûxandin, herwiha bi 100 hezaran darên welatiyên Efrînê hatin birîn û ji bo Tirkiyê hatin şandin.

Bi hatina salvegera 5'an ya dagirkirina Efrîn, xwendekarên Zanîngeha Rojava ku ji Efrînê ne ji me re axivîn û diyar kirin wê bi berxwedana azadiyê, Efrîn were rizgar kirin û ji dagirkeran jî wê hesap bê xwastin.
Xwendekara Zanîngeha Rojava Rêgez Hemo ku ji xelkê Efrînê ye, behsa roja dagirkirina kir û wiha got: "Weke îro di sala 2018'an de û piştî berxwedana ku 58 rojan ji



aliyê hêza QSD'ê û gelê Efrînê ve, li hember dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê hat kirin; bajarê ku bi aşîtiyê û wekheviyê dihat nasîn, hat dagirkirin û komkujî li ser welatiyên wê hat kirin."

**'Bêdengiya cîhanê bû sedemê dagirkirina Efrînê'**

Rêgez Hemo di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser nêzîkatiyên Rusiyayê yên durû ku qaşo ji bo parastina herêmê xwe li vir cih kiriye û wiha domand: "Di êrîşên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên ser Efrînê, Rusiya bû alîkar. Qaşo li herêmê garantor bû, lê ji bo berjewendiyên xwe yên demkî, pêşiya dewleta tirk ya dagirker vekir ku gelê kurd qir bike. Dewleta Tirk a dagirker di êrîşan de mirov,mal, cihên dîrokî, cihên pêroz û xweza jî, kir armanc. herwiha li berçavê cîhanê gelek kiryarên dijmirovî û bê exlaqî li dijî jin, zarokan û nirxên mirovahî kirin. Dewleta tirk dijminê hemû nirxên mirovahiyê ye, lê dîsa jî cîhan li hember di bêdengiya mirinê de ye. Ji bo berjewendiyên pir biçuk jî dikarin qirkirina gelekî bidin berçavê xwe!"

**'Bi vîna gelê kurd û hêza QSD'ê , wê Efrîn were rizgarkirin'**

Xwendekara Zanîngeha Rojava Rêgez Hemo di dawiya axaftina xwe da diyarkir ku wê bi vîna gelê kurd û hêza QSD'ê Efrîn rizgar bibe û wiha got: "Efrîn ne bi tena xwe ye, li pişta wê gelekî xwedî vîneke xurt û hêzeke berxwedêr heye. Dema ku di dilê her yekî ji me de Efrîn hebe, misoger e ku ewê rizgar bibe. Herwiha wê dagirker jî bên ceza kirin"
Xwendekara bi navê Nûra Mihemed ku ew jî yek ji welatiyên Efrînê ye, salvegera 5'an ya dagirkirina Efrînê bibîr xist û got: "Weke îro berî 5 salan, dewleta Tirk û çeteyên wî xaka me dagir kirin, ez yek ji şahidên wê roja reş bûm. Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve çêbûyî, em neçar man ku koçber bibin. Em vê roja reş û bi êş ti carî ji bîr nakin. Di wê rojê de Kurdistan tev xemgîn bû û ewrekî reş li ser dilê Kurdan nixumandbû."

**'Em soza rizgarkirina Efrînê dûbare dikin'**

Nûra Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de şehîdên berxwedana Serdemê bibîr xist û wiha got:"Ji bo parastina xaka pîroz ya Efrînê bi dehan ciwanan canê xwe feda kirin, berxwedanî û fedekarî heta roja Îro dewam dike. Em soz didin ku emê layiqê xwîna şehîdên Efrînê bin û li ser şopa wan bin



heta Efrîn rizgar bibe."

**'Li Efrînê berxwedan berdewam e û heya rizgarkirinê jî wê berdewam be '**

Nûra Mihemed diyar kir ku berxwedana gelê Efrînê hîn bi hemû hêza xwe berdewam e û axaftina wiha qedand: "Ji destpêka êrîşa ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker heya roja me ya îro, hêzên me ranewestiyane û ji bo rizgarkirina Efrînê hertim li ber xwe didin. Di roja bîranîna dagirkirina Efrînê de, bila hêviya gelê me bi QSD'ê û keç û xortên wan hebe. Hêviya me heye ku em vegerin cih û warê xwe û ji ber wê heya rizgarkirina Efrînê wê têkoşîna me bidome."

# PKK: Bi ruhê Newrozê em xwe bidin ber pêvajoyê

**Navenda Nûçeyan**

**Komîteya Navendî ya PKK'ê bi daxuyaniyekê cejna Newrozê pîroz kir û got, di xeta Rêber Apo de, bi ruhê Newrozê em xwe bidin ber pêvajoyê û bi awayekê bi giştî li ber xwe bidin."**

Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) bi boneya Cejna Newrozê daxuyaniyek nivîskî weşand.

**'Wê sala 2023'an bi serkeftinê tacîdar bibe'**

PKK'e d daxuyaniya xwe de Newroz li gelê Kurd, hemû gelên berxwedêr û dostên gelê Kurd pêroz kir û got: "Di şexsê Mazlûm Dogan de, Zekiye, Rehşan, Ronahî, Bêrîvan, Sema, Sara, Rûken, Evîn Goyî, Yaşar Botan, Raperîn Amed, şehîdên Zap, Metîna, Avaşîn û Xakurkê û hemû şehîdên şoreşê bi rêzdarî û minet bi bîr tînin, soz didin ku em ê bibîranînên wan bi serkeftinê tacîdar bikin. Em, bawer in ku wê gelê me û hemû hêzên berxwedêr, wê sala 2023'yan têkoşîna ji bo demokrasî û azadiyê bi ruhê berxwedaniyê Newrozê yekcar geş bikin û bi serkeftinê tacîdar bikin."



**'Rejîma faşîst, li dijî gerîlayên azadiyê sûcên şer dike'**

PKK'e da zanîn ku faşîzma AKP-MHP'ê ya mêtinkar-qirker, hêza NATO'yê jî wergirt, çi tiştê dikare seferber bike, kir, bi hemû derfetên xwe yên 8 sal in ku bi awayekê nedîtî êrîşê Tevgera Azadaiyê dike û wiha domand: "Armanca wan dewleta Tirk a dagirker , di sala sedemîn a avabûna Komara Tirkiyeyê û Peymana Lozanê de, Tevgera me ji holê rabike. Ji wê boneyê bêyî tu exlaqekê şer, pîvanên hiqûqî û mirovî bombeyên nukleer ên taktîk, çekên kîmyewî jî di nav de, her tişt ji xwe re rewa dibîne. Rejîma faşîst, li dijî gerîlayên azadiyê her roj sûcên şer dike. Li dijî vê şerê ku faşîzma AKP-MHP'ê bi hemû hişma xwe bi awayekê bêyî exlaq û rêgez dike, jin û mêrên ciwan ên Kurdistanê, li çiyayên Kurdistanê destan nivîsîn."

**'Divê mirov bi ruhê seferberiyê bixebite'**

PKK'e da xuyakirin ji bo başkirina birînên ji ber erdhejê çêbûne, hem jî ji bo rejîma faşîst a AKP-MHP'ê têk biçe, divê ku mirov bi ruhê seferberiyê bixebite û wiha dewam kir: "Divê mirov bi hişmendiya ku di sedsala avabûna Komara Tirkiyeyê ya mêtinkar-qirker û peymana Lozanê de wê bi van hilbijartinan gelek geşedanên giring rû bidin, xwe bide ber. Têkçûna faşîzma AKP-MHP'ê, şikestinek e di hişmendiya dewleta Tirk a mêtinkar-qirker de. Diyar e ku wê bandora encamên vê li ser geşedanên hem li Tirkiyeyê û Kurdistanê hem jî li Rojhilata Navîn gelek be. Rojên dîrokî ne ku em tê de ne. Divê em her roj û hêr kêliyê pir baş bi rêxistin bikin, pir bixebitin û bi ser bikevin"

**'Bi ruhê Newrozê em xwe bidin ber pêvajoyê'**

PKK'e da zanîn ku destkeftiyên vê pêvajoyê, xeterî û fersendên wê jî wê gelek bin û wiha domand: "Di xeta Rêber Apo de, bi ruhê Newrozê em xwe bidin ber pêvajoyê û bi awayekê bi giştî li ber xwe bidin, teqez e ku çi tiştê heye mirov ji nû ve bi awayekê bi heybettir û bi mirês bi dest bixe."

**'Divê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bê armanckirin'**

PKK'ê daxuyaniya xwe wiha domand: "Bi pîrozbahiya Newrozê ku wê bi şiara "Her der Newroz, her der Azadî" li çar parçeyên Kurdistanê, li çiyayên Kurdistanê, li çi cihê ku gelê me lê ye û Newroza ku wê li Ewropayê bê kirin, divê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bê armanckirin. Wê bi milyonan kes ji bo azadiya Rêber Apo biqîrin û bi şiara "Her der Newroz, her dem azadî" agirê Newrozê yekcar gur û geş bikin. Jin û ciwanên Kurdistanê, bi pêvajoya berxwedanê ya Newrozê re, bêyî navber li têkoşînê dewam bikin û di her astê de wê erk û berpirsyariya serhildan û berxwedanê bi awayekê serkeftî bi cih bînin û sala 2023'yan bikin sala serkeftinê."